Sexbêriya kal û pîrî ji bo her kesî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Swêd welatek baş e, ku mirov tê de bijî û bi temen bibe. Dirêjiya temenê mirovên swêdî, di nav wan welatên, ku mirovên wî dibin xwedî temenê herî dirêj e. Ev ji ber xurtbûn û dewlemendbûna welatê me ye. Ew derfetpeydakirinên me yên bi zaniyarî ya ji bo xurtkirina welatê xwe, neha em gihandin ser encamek baş. Em her ber bi pêş ve diherin. Nuha em sexbêriya kal û pîriyê (äldreomsorg) hîn pêş ve dibin. Em dixwazin welatê Swêdê bibe baştirîn welatê li dunyayê ji bo me yê, ku dixwazin tê de kal û pîr bibin, hingê dewlet, Avahiya Bilind ya Kar û Barê Laşsaxiyê û şaredarî hemû pêkve bixebitin.

Derfetfirehkirina ji bo sexbêriya kal û pîrî ji mêj ve dest pê kiriye. Me sînorê baniyê bilind (makstaksa)‘yê lêçûna sexbêriya kal û pîrî pêk haniye. Ji bo kesên salên wan ji ser 65’î berjor, me piştgiriya lêçûna bilind a dinansexbêriyê (högkostnadsskydd) pêk haniye. Şarederî û Avahiyên Laşsaxiyê, bûne xwedî derfetên pirtir ên dî, ku di barê sexbêriya nexweşiyê û sexbêriya kal û pîrî de, xwe bigehînin ber encamek baştir. Çavdêriya li sexbêriya kal û pîrî zexmtir bûye. Piştgiriya ji bo mermalan û rêxistinên dilxwaz çar qat hatiye bêhtirkirinê li 2006’ê.

Personel bingeha sexbêriya çak e
Kar û barê personelên sexbêriyê ji berê pir tevlihev û mazin bûye. Ev personel î roj pêşberî nexweşên kal û pîrên, ku her derê wan diêşê dibin. Kal û pîrên ku xirifîne û ew kal û pîr ên ku zimanê wan ê zikmakî zimanek din ji bilî swêdî ye. Ji ber ku pêdivîyek e, ku personel bibin xwedî derfetên baştir, divêt bernameyek ji bo bêhtirkirin û

pêşvebirina jêhatîbûniyê ya neteweyî (nationellt kompetenssystem) were qanûnkirinê. Her wisan jî li ser jêhatîbûna herî kêm lêkolîn bihêt kirinê.

Derenceya jêhatîbûniyê (kompetensstegen) derfetek grîng e, ji bo kar û barê sexbêrî û lênêrina kal û pîran. Ev dihêt wê wateyê, ku ji ser milyar kronê lêçûna karê bêhtirkirina jêhatîbûna personelan ya sê salan e. Di navbera salên 2006 û 2007'ê de, derfetên ji bo bêhtirkirina jimareya erkdariyê li nav şaredariyan bilind bû. Ev bêhtirkirina jimareya erkdariyê, wê ji bo bilindkirina kvalîteya hem sexbêriya nexweşiyê û hem jî lênêrinê bilind bike. Şaredarî ji bo bilindkirina kvalîteya sexbêriya malê (hemtjänsten) û kar û barê lênêrînê (omsorgsverksamheten), bûne xwedî derfetên erkdarkirina kesên ku ji mêj ve xwedî ne çi karekî (långtidsarbetslösa) ne.

Swêd wê bibe welatê herî baş a dunyayê ji bo kal û pîran
Li nav van deh salên li pêşiya me, em pileya bêhtirkirina derfetên sexbêriya kal û pîrî bi deh milyar kronan bilind dikin, ku lênêrinê li tevayiya welêt pêş ve bixin. Pîlana netewî ya pêşxistina sexbêriya kal û pîrî, dibe biwêjek giştî ji bo baştirkirina sexbêrî û lênêrînê ya kesên herî nexweşên xirab. Ev ji bo wan peydakirina ewletiya li mala wan û ji bo baştirkirina lênêrîna civakî ye. Ev hem ji bo pêşîlêgirtina kêmaniyan e. Di vê kar û barê derfetpeydakirinê de, gelek pêşniyar hene.

Em her wisan jî dixwazin ji bo van pêwîstiyan lebata lêkirina mal û xaniyên taybetmend (särskilda boenden) xurt bibe, em dixwazin bi alîkariya doktoran û bi alîkariya bêhtirkirina derfetên personelan, baştirkirina sexbêriya nexweşiyê ya li malan (hemsjukvård) cîbicî bibe. Em dîsan dixwazxin jêhatîbûna li ser pirsên xirifînê û her wisan jî karê dilxwaziyê bêhtir bibe. Navêndên alîkariya dostan (väntjänst) û lokalên kombûn û rûniştinan ava bibin. Biryara alîkariya li ser tevayiya welêt wekhev be û derfet ji şaredariyan re were peydakirinê, ku ew bêyî meyizandina pêwîstiyê, ji kal û pîran re alîkariyê bikin.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya Sosyaldemokratan, ya derfetbêhtirkirina li ser sexbêriya kal û pîrî, Moderat û ew hevbendiya (högerallians) baskê wan ê rastê dirawestin. Moderat dixwazin pereyê derman û serlêdana nexweşxanê zêde bikin û herzankirina dermanê ji sîstema herzaniyê ji binî ve rakin. Di ser de jî Moderat dixwazin ew kesê ku zû karkenar (förtidspensionär) dibe, li tevayiya jiyanê, bibe xwedî mûçeyek kêm a mûçeya karkenariyê. Moderat dixwazin bi xirabkirina bingeha jimartina tarîfa karkenariya temenê, pereyê kesên karkenar kêm bikin.

Li wî welatê Swêdê yê Moderatan, kêmkirina bacê, berî kvalîte û xurtbûna civakê dihêt. Mirovên bi temen pêwîstiya wan gelek ji bo sexbêriyê heye û ev mirov wê ji ber buhayiya sexbêriyê, û buhayiya dermanan û serdana nexweşxanê, rastê dijwariyên gran werin.

Moderat û ew hevbendiya baskê wan ê rastê, dixwazin pey der pey bacê kêm bikin ku pileya wê were ser pileya welatên mayî yên Ewrûpayê. Ev dihêt wê wateyê, ku 250 milyar kron ji kîsê me yê beşdar winda dibe. Ev li serê kal û pîrên me diteqe. Ev ê welatê me bi yekcarî biguherîne. Ev dihêt wê wateyê ku gava ew kesê ku pêwîstiya wan bi sexbêriyê hebe, gerek li nêzîkê wê dawiya temenê xwe, yan pere ji ser kîsê xwe bide, yan jî bibe barê ser kîsê meriv û mermalên xwe.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?